

Kirasguhastina rêzdar XELÎLÊ BERFÊ, dengbêjê ku şahîdê zargotina Êzdiyan yê herî bi nav û deng, ez gelekî xemgîn kirim!

Mîn jî bi dilekî xemgîn bihîst ku şahîdê zargotina me Êzdiyan yê herî bi nav -deng û dengbêjê di nava civaka me de zahf dihate hizkîrn XELÎLÊ BERFÊ(1920-2008), di 03.04.2008 de kirasguhastiye.

Ez dizanim şahîdên mîna dengbêj XELÎLÊ BERFÊ, yê ku di peyvên stranên xwe de gelek serpêkhatiyên netewa me Kurdan û bi taybetî jî piraniya buyerên bi serên endamên civaka me Êzdiyan ve hatî zelal didana xwanê kêmbûn. Dilêşa min ya herî mezin jî ewe, gava ev **şahîdên zargotin û floklora me Kurdan** kiras diguhêz(dimir)in û bi taybetî jî gava yekî ji “revebir”, “berpirsyar” û “rêberên” civak anjî netewa me ew arşîva di dilê wan de hebû tomar ne kiri be, hingê piraniya xizna arşîva çande û kultura me ya herî zindî û ne hatî lêkolîn kirin jî bi wan re binax dibe.....

Mixabin heta nih tu firsenda min çênebû ku ez li ber rêzdar, dengbêj, zahmetkêş û Xwedê jê raziyê XELÎLÊ BERFÊ rûnêm û xwe berdime nava vê arşîva di dilê wî de hebû. Lê, min çend stranên dengbêjê di nava civaka xwe de hizkîrî ji ber kasetekî dengê wî nivîsandibûn û ew jî di kitêba xwe ya bi navê “Hebûn û Tûnebûna Êzdiyan Tev Romanên Zîndîne-2000” de weşandine. Ez niha çend malikan ji wan stranên rêzdar dengbêj XELÎLÊ BERFÊ pêşkêşî we hêjayan dikim.

“Şerê Şêx Mîrza (1828..?)

Wezîro wezîro oyo,
Lo lo şêxê mino,
tiştê te kir, kesî li darê dinya yê nekir,
kesekî perî bavê Hesên û Melo,
Şêxê Anqosya, şêxê Doqatê,
berxê Koza wezîr,
derê sara Diyarbekirê bi xwûnî nekir.

Lo Wezîro,wezîro oyo
welle ezê çibikim,
kolênciya destê, bavê Hesên û bavê Melo,
şêxê Anqosya,şêxê Doqatê,
berxê koza wezîr,
xwe iro ji nava xwûna kûçikê kumsora lez berdaye,

Lo lo wezîr wezîro oyo
xopana Kelê sara Diyarbekirê,
bê sewite dê Kanîne
ezê nakewime ber kustina,
bavê Hesên û bavê Melo,
Şêx Hesên, Şêxê Anqosiya, berxê
koza wezîr, xortê nû hatî,
gelek hene, li Dinya yê
berxê koza Êzîdi, xortê nûhatî,
ezê ketime ber wê yekê kuçikê ,
koçerên van Medîyan û Keçkoriya,
iro sê rojin li zozanê jorin lê ser
pez û Berxê me danîne.
ax wezîr yir

Şerê Delan (1830)

Heyla dayê Delane
Heyla bavo Delane
Nûrê digo:
Emo lawo de deleano
Qaso birayo delane
Lê lê Rewşê mala bavê şewitîyê delane
De hûnê dev ji malê dinya yê berdîn
Malê dinya yê hemûk qirêja destaye

Min di eskerê mala Dewrêş begê hat û girane ,
ewanê derbekê dane li Hemo, Sîno û Xaço
azbata bavê min rebenê , anîne ber mîratê.
Ezê piştî xortên Êzîdiyan, Peyayên Neqîbiyan
Çibikim ji Terş û Talanê giran , malê dînya yê
Digo :

Dewrêşê mala Dewrêş begê
Serê xortên Êzîdiyan jê kirine
Cenazên wan bi ava çemê Ridwanê ve berdane
Cenazên Xortên Neqîbiyan,
çûne heta serê Dû avê,
newala şêlîwa û pira Bota
Eza gulî birê
Îro sê roje cenazên
Xortên Neqîbiyan
Çûne li gola Materê geriyane

.....

Şerê Erenzê

Rindê digo : Edlayê
Erenza Şêxan bi şewite bi darê tere
Erenza Xopan bi şewite bi darê tere
Hesabê Cîbo hatiye li Kela Rimêlê,
bi tevî koma Şêxên Ereban û eskerên:
Eynikê, Eyndarê, Eynkafê, Eynberanê,
çiqas Hecî, Sofyên Xerzan, Xiya û Bekiran
hemû anîne bixwere.

Min dît Mêçoyê mala Şêxo
Li Êganê Meyro,
li Keleşê Çelo,
li Şêx Hemê Seyro,
li Gêçanê Gîro,
li peyayên Neqîban,
li xortên Qizîlan û Êzîdiyan
dikre gazî û digo:
Bav û Biran ,hûnê mêhrî çêbin,destê xwe xweş hilînin.
Êganê Meyro li egît û xweş Mêran dikre gazî û digot:
Ezê bi bayrqa Êzî kim, heger Xwedê û Siltan Êzîdî îro bi mere rast hilîne ,emê bikin; heft roj û heft şevan,Aşê
Sipî û aşê Ridwanê li ber xwîna reş bigere.

.....

(Ev stranên ji ber dengê Xelîlê Berfê, ku di kasetekê de gotibû hatine nivisandin.)”

Dibêjim, bila rahma Xwedê li rêzdar XELÎLÊ BERFÊ be !

Sersaxiyê û sebrê ji hemû nefêrên malbat, dost û pismamên wî ra dixwazim.

Kemal Tolan
04.04.08